Li hola D.Nûredîn Zaza: 59 salya koçkirina Mîr Celadet Bedirxan hate bi bîranîn

15/07/2010

Di roja 15/7/2010 Li hola D.Nûredîn Zaza li bajarê Qami_lo, bi amadebûna mamoste Hemîd Derwî_ sekretêrê partiya dîmoqratî pê_verû kurd li Sûriya û hejmarek ji nivîskar û rew_enbîrên kurd, 59 li ser koçkirina Mîr Celadet Bedirxan hate bi bîranîn

Di destpêkê de nivîskar Konê Re_ nivîsek xwe li ser vê rojê amadekiribû di bin navê (Ekola HAWAR ê) Di 59 Saliya Koçkirina Mîr Celadet Bedirxan deDi vê nivîsa xwe de K.Re_ bêtir li ser guhdana Mîr Celadet Bedirxan bi zimanê kurdî sekinî, pêre jî li ser rola Hawarê rawestiya û encamên vê dibistanê bi van xalan da nî_andan- Pex_ana Kurdî a nivîskî bi tîpên latînî destpêkir

- Bingehê gramêra kurdî hat danîn
- Edebiyata kurdî a nûjen destpêkir
- Bingehê Ferhenga kurdî hat danîn
- Wergera bo zimanê kurdî destpêkir
- Ekola HAWARê pirek bû, di nav edebiyata kurdî û cîhanî de
- Pirtûkxaneya kurdî hat danîn û bi xêra wê 20 pirtûk ji we_anên wê hatin çap kirin- Zargotina Kurdî, ji folklor û kilasîkê ber bi nivîsandina edebiyata nûjen ve çû û ew zargotin hat danhevPi_tre mamoste Derwê_ê Xalib li ser rola malbata Bedirxaniyan axivî û hindek bîranînên xwe bi D. Kamîran Bedirxan re anîn zimanDi dawiyê de guftûgo hate kirin li ser xebata Bedirxaniyan û bi taybetî li ser Mîr Celadt û D.Kamîran Bedirxan, di pê_iyê de mamoste Hemîd Derwî_ li ser vê rojê axivî û rehim û gorbihi_tî ji Mîr Celadet re xwest û da xuyan ku mîr Celadet û D. Kamîran tucaran di berjewendiya xwe ya kesayetî de ne diramiyan dema xebata xwe dikrin, na belê herdem xwesteka wan bû ku çand û wêjeya kurdî û doza kurdî bidin pê_, û dixwestin bi medeniyet xebata xwe bikin,ji ber vê yekê jî vê malbatê gelek sitem dît , ne tenê wilo lê belê hebûna wan wek malbat hat lê xistin li ser destê dewleta tirk ,niha jî pir hindik ji wan belawela mane Hemîd li ser hinek bîranînên xwe bi D.Kamîran re axivî û weha got : (min D.Kamîran li Kurdistan Iraqê dît di dema _ore_a nemir Mela Mistefa Berzanî de, û min di dît bê çawa Nemir Mela Mistefa gelek qedr û qîmet dida D.Kamîran, ku Mela Mistefa tu caran nedida pê_iya D.Kamîran û gelek rêz urmet jêre digirt û herdem ew dida pê_iya xwe)Pi_tre mamoste Selman Hiso li ser bîr û ramanên malbata bedirxaniyan rawestiya û bal ki_and ser ramanên wan yê ku tenê bi kurdayetîyê ve mijûl bûn,tu car bi berjewendî xwe ve girê nedidan , ew wek serok û mezina di xebitîn ku ew di dema xwe de çep û rast neçûn wek kurd kar dikirin û neketin bin bandora _epitya ku geleka jê ticaret jî kir , na belê derdê wan xizmeta doza kurd û miletê kurd bû Di dawiya vê bîranînê de hindek ji amadehiyan jî pirs û genge_e kirin. Û dane xuyan ku rojên wisa pêdivî ne ji miletê kurd re, da xebatkarên kurd di gora xwe de bi vehesî serî deyninPi_tre , Mamusta Hemîd peywendiyek bi telefonê bi Sînem Bedirxan re kir , silavê hevalê hazir gihandinê di roja bîranîna koçkirina bavê wê de û sipasî bo malbata bedirxanya kir